# NEWROZ



Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988



Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .

Ji *weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ*
*Email :* Newroz95@hotmail.com

| Hejmar(70) | Çirriya Pêşîn | 2006 z-2618 k | Buha (15 ) p.s |
|---|---|---|---|


# Li Şamê

## Pêncê Çiriya yekê 2006-an

Cara yekemîn bû ku, bi vê tevahiyê, serûber hêzên siyasî , civaka şaristanî, mafperest, mirovhez û rewşenbîrên ku , ji desthilatdariya parta Be'is re neberdevik, li pêşî hêzên danezanîna Şamê – Îlan Dîmeşq – li navenda paytexta Sûriyê li roja pênşemê 5-ê Çiriya yekê 2006-an , li pêş û derdora avahiya seroktiya şalyaran xwe tev didin û tevgerê dikin. Da ku karibin, dengê xwe bighînin dewlet û raya giştî, bona çareserkirina pirsa kurdên bênifûs, li parêzgeha Hesekê , ku ev e 44 sal in di ser re dibore.

Bi rastî ev çalakiya he , kir ku , têklî û karê hevpar, di navbera Kurd û Ereban de hê bêtir xurt û geştir bibin. Rê li ber siyaset û xefkên rijîma Be'is a şoven û malxur teng bibe û bête girtin. Ev reng siyaseta ku dixwaze xelkê berde hev û baweriya bi karê hevpar bişkîne, di navbera hêzên civaka Sûrî de sarbûn û dijayetiyan biçîne û geş bike.

Hêjayî gotinê ye ku , parta yekîtî ya demokrat a kurd li Sûriyê, weke birekî giring ji tevgera kurd, ji roja pêşî ve , ji berî bêtirî deh salan, biryara xwe dabû ku, berê xelkê xwe bide Şama paytext. Da ku karibe, deng bi pirsa kurd û bênifûsiyê xîne . Di ber vê yekê de, gelek heval û hogir dihatin girtin. Di pê re , li gel Hevbendiya Demokrat û dûv re , Berê Demokrat û li vê dawiyê, hemî partî û rêxistinên kurd digel ên Ereb û Sûrî, yên ku li beramber rijîma Be'is dibêjin na. Tev ketin wê baweriyê ku, bona çareserkirina pirsa bênifûsiyê, pêwîste xebat û çalakî, bi her hawî, nemaze bi şêweya kombûnên cemawerî li Şamê, di lêhatina salvegera bîranîna vê pirsê de bêne kirin.

Baş xuya ye ku, ew sozên karbidestan , bona çareserkirina vê pirsgirêkê, yên ku gelek caran dubare dibûn, dimane sozên xapînok û dibûne kenpêkirin.

**Sînorê Yekta**

www.arsivakurdi.org

Nûçe û çalakî Nûçe û çalakî Nûçe û çalakî

# Li Qamişlo

## Kovar û weşanên bi zimanê kurdî yên li Sûriyê têne weşandin
## 22 saliya koçkirina Seydayê Cegerxwîn bi hev re bi bîr anîn

Kovar û rojnameyên kurdî, yên li Sûriyê têne weşandin :(Aso, Newroz, Pirs, Perwan, Jîn, Roj, Gelawêj, Hevind, Deng, Komîta çalakiyên kurdewarî, komîta fêrbûna zimanê kurdî) .Bi beşdariya gelek nivîskar, helbestvan û rewşenbîrên kurd, roja 27/10/2006 an, li katmjimêr 6ê êvarê, ahenga 22 saliya koçkirina Seydayê Cegerxwîn li dar xistin.

Şevê, bi sirûda netewa kurd destpê kir, mêvanan berhemên xwe, ji beşdaran re pêşkêş kirin. Gelek gotar, birûsk û name ji nivîskar û malperên kurdî gihane destê komîta bîranîna 22 saliya seydayê Cegerxwîn. Lê mixabin, ji ber tengbûna demê, derfet tunebû ku, hemî di şevê de bêne xwendin.

Em li jêr navnîşana wan lêkolîn, gotar, name û birûskên şevê û navê xwediyên wan belav dikin.

- **Berzo Mehmûd**: gotina weşanên kurdî li Sûrî ,yên kû bi vê çalakiyê rabûn.
- **Kisra Cegerxwîn** / Elmaniya : gotina malbata Cegerxwîn
- **Seydayê Keleş** : helbeste
- **Derwêş Xalib**: Cegerxwîn / lêkolîn
- **Azad Hemo**: Dad / helbest
- **Ebdulselam Darî** : kurtejiyana Cegerxwîn / gotar
- **Adil Dîlanî**: Qamişlo / helbest
- **Xalis Misewer** : Romansiyet, di helbesta Cegerxwîn de / lêkolînek Rexneyî
- **Bavê Hozan** : helbest
- **Konê Reş**: Cegerxîn ji ferheng û wêjeya gelê kurd re, sermyanekî sembolî ye / lêkolîn
- **Bavê Perwîz** : helbest
- **Rezoyê Osê** : Xwendinek, di berhemên Cegerxwîn de / lêkolîn
- **Dildar Mîdî** : Gunehê kê mezintir e… ? /helbest
- **Bavê Şêrîn** : gotina Girûpa Dêrika Hemko ya çandî
- **Dildar Aştî** : helbest
- **D. Azad Elî** : gotin
- **Ehmed Ebdo** : Mele / helbest
- **Ebdula Gedo** : Xama kurd / helbest
- **Mele Mihemed** : gotin
- **Ferhad Içmo** : Helbest name / helbest
- **Mihemed Ismaîl** : gotin
- **Helîm Ebû zêd** : Heware / helbest
- **Heyam Edulrehman** : kurko dîno / helbest
- **Ehmed Gero** : gotin
- **Nesrîn Têlo** : soza hestyara / helbest
- **Mûsa Oskê** : helbest
- **M. Salih** : Evîna dil / helbest
- **Mehmûd Sebrî** : helbest
- **Omer Ismaîl** : ma kurdînî wehaye / helbest
- **Nafii Beyro** : helbest
- **Siyamend Brahîm** : gotin
- **Şiyar Omer Lalê** : Efrîn / helbest

Her weha gelek name û birûsk, ji hundirî welêt û ji der ve gihiştin destê komîta bîranînê: Evên xwar navê wan kesan e , ku name û birûsk şandine:

- **Nesredîn Ibrahîm** : sekerterê El-partî / / birûsk

→

www.arsivakurdi.org

- **Ezîz Xemcivîn** – Dubey : birûsk
- **Stelayta Kurdistan** : birûsk
- **Can Kurd** : birûskek û 2 lêkolîn / Şoreş û serxwebûn di hozanên Cegerxwîn de, û welat li ba Cegerxwîn /
- **Besam Mistefe** – Hewlêr : birûsk
- **Hunermend Şevger** – Siwêd: birûsk
- **Koçka Rojavaya Kurdistan** : birûsk
- **Orkêş** : birûsk
- **Bavê Berzan** : birûsk
- **Koma Mîdiya :** birûsk
- **Feysel Ismaîl**: birûsk
- **Hevgirtina rewşenbîrên kurdên rojava li derveyî welat** / birûsk
- **Malpera rojava** www.rojava.net / birûsk
- **Dilbixwin Dara** – berpirsê Malpera / www.avestakurd.net / birûsk
- **Malpera welatê me** www.welateme.net / birûsk
- **Cîhan Roj** : Holenda / birûsk
- **Malpera Keskesor** www.keskesor.info / birûsk
- **kebez** – Elmaniya : birûsk
- **Malpera Newroz** www.yek-dem.com / birûsk
- **Dezgeha SEMA ya çand û henera kurdî** – Dubey / birûsk
- **Helîm Yûsiv** : birûsk
- **parêzer Hesen Mişo** : birûsk
- **Koma Şanîdar** – Tirbespî : birûsk
- **Koma Helebçe** – Aliyan : birûsk
- **Şêrwan Omer** - komele kurdên li Nerwêj KKSN : birûsk
- **Ibrahî Elyûsiv** / komîta amadekar ya hevgirtina nivîskar û rojnemevanên kurd / birûsk
- **Diya Ciwan** – Şam : birûsk
- **Yûsiv Berazî** - Serê kaniyê : birûsk
- **Selman Barudo** / birûsk
- **Deham Ebdulfetah –** Amude : birûsk
- **Siyamend Mîrzo** : birûsk
- **Ehmed Heyder** : berpirsê Kovara (Nercis) / birûsk

-**hunermend (Iitidal)** : stranek pêşkêşkir

Bi vî şêweyî aheng bi dawî hat.

Li jêr, em deqê birûska malpera Newroz a navenda çand û ragihandinê ya ku ji ahengê re hatibû rêkirin diweşînin:

**25/10/2006**

## Komîta bîranîna 22saliya koçkirina Seydayê Cegerxwîn

Bi navê malpera **NEWROZ,** em karê we kovar û weşanên bi zimanê kurdî li Sûriyê pîroz dikin, bi hemî hêz û hinera xwe, piştgiriya vê xebata we ya hevbeş dikin, bi omîd û hêvî ne ku karê we serkeftî, bi rêkûpêk derbas bibe.

Bêgomane ku qedexekirin û bendkirina zimanê me yê kurdî li Sûriyê, bandoreke neyênî li zimên kiriye, rê li pêş geşkirin û pêşketina wî ya xwezayî girtiye, ji ber ku dema zimanek di dibstan û zanîngehan de neyê xwendin û fêrkirin, lêkolînên zanistî yên berfireh li ser rewşa wî neyên çêkirin, ew ziman diçilmise, şûnde dimîne, dikeve astengî û aloziyê.

Lê, bi saya serê mezin û navdarên gelê me, ewên ku xwe di ber vî zimanî de westandine, kovar û rojname pê weşandine, zimanê bav û bapîrên me li ber xwe daye û ew di dil û hişê me de bilind û parastî maye.

Rêzdaran...

Tiştê ku dilê me şa dike ewe ku hê jî rêya têkoşîn û xebatê di ber zimên de berdewam e, vaye îro, we daye ser wê rêya pîroz, rêya parastina ziman, çand û folklora kurdî, rêya rêzgirtina navdarên gel ên mezin mîna Sedayê Cegerxwîn.

Hêviya me ewe ku hun kovar û weşanên bi zimanê kurdî, mil li mil, li gel hemî rewşenbîrên kurd, bi dilekî germ û hişekî vekirî, dest bidin hev û xebateke kêrhatî ji bo ziman û toreya gelê xwe bikin.

Li gel rêz û silavên malpera **NEWROZ** – Navenda çand û ragihandinê.

www.arsivakurdi.org

# Li Şam – Munteda Nûredîn Zaza

***Di 14.10.2006an de , li Şam , Munteda Nûredîn Zaza , bi beşdariya gelek siyasetvan û rewşenbîrên Kurd , Ereb û Aşûr Xelata Dr.N.Z pêşkêşî pênc kesên navdar û xwedî rol dike . Kesên hatine xelatkirin ev in :***

1- Mamoste **Isme'îl Umer**, serokê partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê .

2- Rewşenbîr û rikberê Sûrî, **Mamoste Ekrem Bunî** .

3- Rewşenbîr û rikberê Sûrî yê zîndankirî , Mamoste **Mîşêl Kêlo** .

4- Berpirsiyarê rikxirawa Aşûrî , Birêz **Gibra'îl Mûşê** .

5- Helbestvanê Kurd, ê bi nav û deng , **Yûsêf Berazî** .

Gotinên di wê şevê de , hatine xwendin evên jêrîn in :

1-Gotina ji ber **Mîşêl Kêlo** ve .

2- Gotina **Ekrem Bunî** .

3-Gotina **Gibra'îl Mûşê**.

4- Gotina **Isma'îl Umer**

5- Çend helbest , ji aliya **Yûsêf Berazî** ve(Bêbuhar) .

6-Gotina **Hemît Hec Derwîş** sekreterê partiya pêşverû ya Kurd li Sûriyê .

7- Gotina Mamoste **Nesredîn Ibrahîm** sekretêrê partiya Elpartî ya di Hevbend de .

8- Gotina bi navê Munteda Etasî ya elhîwar eldîmoqratî , li Sûriyê .

9- Gotina **Welîd Bunî** ya bi navê Buhara Şam .

10- Gotina Nivîskarê hêja , mamoste **Cemal Eclûnî** .

11- Gotina Mamosteyê Kurd **Ebdilîlah Ibrahîm Paşa Milî** .

12-Birûska ji bal helbestvan **Ferhad**.

**Îçmo** ve hatî

13- Gotina mamoste **Mihemed Ceza'î** ( bavê Koşkîn ) .

14- Gotina rojnama **Newrozê** .

15-Gotina partiya Elwîfaq Eldîmoqratî ( Rêkeftin ) .

16- Gotina rewşenbîrê ciwan , Heval Yûsêf Neyo .

17- Gotina toreyî ya helbestvan Can baoîr .

Hêjayî gotinê ye ku , em bibêjin , ev boneya , ne tenê ya xelatkirinê bû û hew . Lê belê , bû boneyeke guftogo û hevenasîna Kurd , Ereb û Aşûran jî . Û cara yekê ye , ku rewşenbîr û rikberekî Ereb mîna mamoste Cemal Eclûnî:Bi zarzimanekî aşkere, ji hevnetewa xwe , lêborînê ji gelê Kurd hêvî dike û bi taybetî ji serok û qeralan doz dike , ku şopa wî bigirin , dev ji nijadperestî û şovenîzmê berdin û biratiya gelên pê re dijîn bigirin .

Em jî , ji aliyê xwe ve , wek komîta birêvebirina **weşana Newroz** , sipasiya komîta birêvebirina Munteda Nûredîn Zaza dikin û hertim , em ji ton karên weha re piştgir in.

Vaye li jêr , emê gotina Newrozê biweşînin :

**Bila ev boneya bibe boneya**
**Wergirtina kelk û sûdan**

- Rêz û silav , ji komîta birêvebirina Munteda Çandeyî ya Nûredîn Zaza re
- Rêz û silav, ji beşdarên vê şevê re.

-Ciwantirîn rêz û silav, ji giyana nemir **Nûredîn Zaza** re. →

www.arsivakurdi.org

Li ber roniya vexwendina vê komîtê , ev cara diwem e, em têne şam û mirina lawê Kurd yê bi nav û deng N.Z bi bîra xwe tînin . Di cara yekem de , me N.Z wek zimanhezekî bi beşdaran da nasîn , herweha me Rojnama Newrozê , di ber çavan re bir û anî û rola wê di dermafê fêrkirina bi dehan xelekên alfabê û rêzimên ji keç û lawên Kurd re , me da xuyakirin . Wêlomê jî ,me ji birêz Zaza re got, di gora xwe de vehesî be , law û keçên Kurd şopên yên weke te bernadin .

Di vê boneya bîranînî ya diwem de jî , dixwazin ji xwe re bikin keys , kelk û sûdê, ji gotina **Celadet** ya dîrokî werbigirin.

**Yekîtiya gel bi yekîtiya zimên e , yekîtiya zimên jî , bi yekîtiya tîpan e .**

Li ber roniya gotina jorîn, em dixwazin nêrîneke zimanewî ,bi ziman û gelê me gereke, bidin xuyakirin .

Weke em dizanin , bêparbûna netewa Kurd ji sed salan ve , ji avakirina dewleteke yekbûyî , bû sersedema diyarbûna gelek zarav , tore û alfebeyan. Di zimanê Kurdî de, ev pirbûna zaravan, bi xwe jî, di roja îro de , ji pêşeketin , vejîn û dewlemendkirina zimanê me re sermiyanekî baş e. Ji zaravên Kurdî, hin hene yên peyvandin û azaftinê ne , mîna Kurmanckî , Dumilî , Zazakî , Hewramî , Gorî û Lorî . Ev zaravina Kevin in û di dîrokê de tamar berdane . Vêca bikaranîna wan , ji bo geşkirina zimên pêwîste.

Lê , li kêlekê di cîhana tore û rojnamegeriyê de , herdu zarav Soranî û Kurmancî bi kar tên û li çar perçeyên Kurdistanê têne têghîştin .

- Li aliyekî dî , berê nivîsandina Kurdî, bi sê alfabeyan bi kar dihat ( Latînî – Erebî – Kirlî ) . Ta ku , Kurdên Sovyêta berê dev ji alfabeya kirlî berdan û li şûnê alfebeya Latînî bi kar anîn , kend û girêk li pêş yekbûna zimên kêmkirin .

Em dizanin ku , bikaranîna alfabeya Erebî , li başûr û rojhilatî Kurdistanê ye. Û alfabeya Latînî jî, li bakur û başûrî rojavayî Kurdistanê , Ewropa û li Sovyêta berê bi kar tê. Ji berê-paşê ve , zimanzan û zimanhezên Kurd yên mîna Nûredîn Zaza , Ji ber ku , yekîtiya zimên ,di wê de didîtin, daxwaza yekîtiya bikaranîna alfabeyekê dikirin . Herweha yekîtiya gelê Kurd jî, xurt dibû . Lê, berê piraniya wan, ji ber van sedeman ve, ber ve alfebeya Latînî ya **Celadet Bedirxwan** bû .

1-Alfebeya di cîhanê de , tewrî bi kar tê, alfebeya Latînî ye .

2-Alfabeya Latînî , Alfabeya Kompiyoter û entirnêtê ye jî .

3-Fonotîka devkî, ya zimanê Kurdî bêtir, bi riya alfabeya Latînî zelaltir dibe û cî tê de digire .

4-Piraniya xelkê me yê Kurd , ta hin girop ji Kurdên başûr jî, vê daxwazê dikin .

5-Ji paşeroja gel û zimanê Kurdî re jî weha baştire , ji ber ku , bi wê ziman û gel, wê were parastin û li gor demê be .

Piştî azadbûna beşê başûr , herçû ev daxwaz û hêviya jor bi hêztir û bilintir bû . Lê mixabin biryara perlemana Kurdistana başûr, ji bo bikaranîna alfabeya erebî ,wek alfabeyeke fermî ,di hemî dezgehên hikomet û civaka xwe de , ew hêvî qelskirin û bêhêvîtiyek peydakir .

Vêca, bi navê vê şevê , em ji serokê navçeya Kurdistanê ( Kak Mesûd ) ,Hikometa Kurdisatanê û Parlemanê re pêşinyar dikin ku , bangek bi rê be . Têde ev daxwaz diyar bibe û bi kêmanî alfabeya Latînî ( alfabeya Celadet , Nûredîn û piraniya gelê Kurd ) netê qedexekirin .

- Bijî gelê Kurd!
-Ramana Nûredîn Zaza namire!
-Sipas ji komîta rêvebir ya xelata N.Z
-Sipas ji we û guhdariya we re !

Komîta rêvebir ya weşana Nwerozê

www.arsivakurdi.org

# Pirsgirêkên Hişê Erebî

**Rozad Elî**

Yeke ji sinc û vewîniyên “ramana tevayî”, dihêle yên din weke wî biramin, kar û xebatên xwe, li gor bername û pirojeyên wê,bi rê ve bibin; ango weke “Birokrost” textekî wan î pîvanê heye.Grke tu li gor wî textî bî, çi dirêjbûn an kinbûna bejna te ji ewî textî, dê bihêle seriyê te jê bibe yan jî tu bête vezîlandin. Daku, tu li gor pîvan û xwestekên xwedî "ramanên tevayî” bî.

Helbet ev hizir û ramyarî ne tenê rojhilatî ye, weke ji rûpelên dîrokê tê zanîn, miletên Ewropî bi xwe jî ne dûrî evê ton ramyariyê bûn; şerên ku di navbera Pirotistant û Kasolîkan de rabibû nimûneyeke balkêş e di vî warî de; di rojekê de nêzîkî (100) sed hezar “bawermend” ji hev kuşt. Lê şerê cîhanê yê duyem, yê ku li hember ramyariya Nazî lidarket hêşt, ku ev ton fikir li welatên Ewropî ku bibe, piştgirên wê newêribin xwe aşkere bikin; heya roja îro nîşana Naziyan qedexe ye û mirov li ser hildana ewê nîşanê tê dadgehkirin.

Lê eger em vegerin rewş û çanda rojhilatî, emê bibînin ku, ew raman ne tenê bûye weke sinc û vewîniyeke me, xwe berdaye tamaran û bûye parek ji netêgihiştina me ya tevayî. Lê ewê ramyariyê hêştiye ku ew bibe yek ji kar û barên me yên rojane û em ewan kesên xwediyên hizrên yek bawerî, ji xwe re bikin simbol û serok jî.

Çavkaniyên sereke, ji ramana tevayî re li Rojhilta Navîn, didu ne:

Ramana hişkbawer ya oldarên Îslamî,

û ramana netewî ya netewperestên Ereb. Em dikarin bibêjin, ku mêjiyê wan Mislimanan, bi tevayî û wan Ereban bi taybetî di kirîzeke tûj re derbas dibe û du rê li pêşiya wan in; yan divê xwe ji pîroziya hizir û deqên olî yên kevin û dirûşmên nijadperestiya netewî rizgar bikin û bi rastî derbasî sedsaliya bîst û yekan bibin û mêjî û zanyariyê ji xwe re weke pîvan bipejirîne, yan jî ewê çend salekî di evê rewşa terorîzmî ya xirab de bimîne û li dawiyê dê tenê seriyê xwe jê bikin, gava ku ji bilî wan ti kesî din li ser evê xakê nemînin; gelên din dê tev li asûmanan bijîn.

Belkî em hinekî, ji mijara xwe bi dûrketibin. Lê dîsan jî, ew di ewê çarçewê de digere. Me got ku, ji xasmayên ramyariya tevayî ye, ew dihêle tu bi zorê, weke wî li tiştan binirî û bibînî, ji ber ku, di bîr û baweriyên xwediyên evê ramyariyê de, ew tenê rastiyê dinasin û ewên din hemû li ser çewtiyê ne. Di evê koşeyê re em dikarin têbighên, ku çima rewşenbîrê Ereb û ne tenê siyasetvanê wan ji mirovê Kurd dixweze, ku weke wî birame û helwestên wan bigre.

Di derheqa eva yekê de, nemaze li evê dawiyê, me gelek deng bihîstin, qîreqîra wan bilind bûye û bang li kolanên Erebî dikin, ku hajî Kurdan û anîna ji Israîliyan re bo başûrî Kurdistanê hebin. Ev ton bang ji aliyê

⟶

www.arsivakurdi.org

rewşenbîr û siyasetmedarên Ereb û bi evê tûjbûn û gurkirina ji aliyê dezgehên ragihandinên Erebî ve, helbet hinek meremên xwe yên sereke hene û di pêşî de, tûjkirin û gurkirina kolana Erebî li ser Kurdan û yek ji encamên evê ton perwerdiyê, bûyerên meha avdarê bûn ku, hêştibû cemawerê Dêrê weke dijminekî bi ser bajarê Qamişlo de bête û ne weke cemawerekî gokê ku, tê cem hemwelatiyên weke xwe.

Lê ji berî ku, em çewtiya evê nirînê , ji xwendevan re didin şirovekirin, em ji xwediyên ewê nirînê dixwezin ku, ew hinekî li dora xwe, li hundirê welatên Ereban binirin. Ji berî ku, gef û guran ji Kurdan re dişînin û ji wan dixwezin; Bila tu têkiliyan bi Israîl re çênekin, ka çima ew ji evan dewletên Ereb ku, ala Israîl di hundir paytextên wan de li ba dibe naxwezin ew têkiliyên xwe yên dîplomatîk bi Israîl re bibirin. Weke em dizanin, bêtirî dewleteke Ereb bi hukumeta Israîl re peymanên aştiyê morkirine, weke Misir, tevî ku ew qubleta Ereban a konevaniyê ye, û ewên ku îmze nekirine jî, ewana û bi rengekî kargirtî ewê peymanê bi cih tînin; ev sîh sal e û di sînorê me û Israîl de yek fişeng jî nehatiye teqandin.

Ji bilî evê yekê jî û eger ku em Kurd bi rengekî hişmendî û bê tirs biramin û helwestên xwe bistînin, emê bibînin ku ti rêdan ji evê dijmantiya ku, dixwezin em bi Israîl re bikşînin tinene; ji bilî ku ew di bin du heyaman de hatiye. Yek bi bandoriya ramyariya Markisizmî, û ji berî wê jî ya Mislimantiyê, ku em bûbûn qurbana hizreke îdyolocî ya nêzîkî bawermendiyê, bêtirî ku nêzîkî kartêgirtiyê be ku, ew bi xwe rengdana konevaniyê ya pêşîn û serekeye. Tiştê dinê ku, dihêle em Israîl weke dijminekî xwe bibînin, ev ton konevaniya evan rêjîmên ku, Kurdistan zeftkirine û hemû rengên êşkencê û pişaftinê li ser me bi kartînin û em; Tevgera Kurd ji tirsê gihandine ewê radeya ku, ew xwe weke tevgereke erebî, nemaze di dozeyên ku bi miletê Ereb ve girêdayî, û ne weke tevgera miletekî ku, du perçeyên Kurdistanê ji aliyê du dewletên ereb ve hatiye zeftkirin, bibîne.

Li dawiyê em dixwezin bi yek gotinê bibêjin ku, konevanî kartêgirtine û ne tenê helwest û bawerî ye, weke ku çawa me fêmkiribû û hîne jî em, bi kar tînin; vegere dîrokê û li têkiliya me bi hersê miletên derdora me, Fars , Ereb û Tirkan re binire ku, em hertim ji ewê din re xebitîne û em hertim bûne qurbanên bawermendiyê û pê hatine xopandin; çi bawermendiya mislimantî dibe û çi jî ya markisizmî be. Lewre îro ji me tête xwestin ku, em di ber dozên xwe de bixebitin û hemû nirîn û baweriyan têxin raja doza miletê xwe û ne hertim milet û doza xwe bikin hilgirên dîtinên xelkê û li gor evê yekê ku, kartêgirtina Kurdan bi Israîl re hebe, çima na ji têkiliyê re û ev dewletên derdora me, di nav wan de Sûryê bi xwe jî, li razîbûna Emerêka û Israîl digerin.

## Lehiya Serê Kaniyê



www.arsivakurdi.org

# Ragiyandina cîhanî ya mafên mirovan

**Li** 10î Çiriya pêşîn 1948 an , komela tevane ya Miletên Yekgirtî , ragiyandina cîhanî ya mafên mirovan ji xwe re wek belge biryar pê da û derxist . Tevaya deqa ragiyandinê, wê di pelên bê de were . Piştî wê bûyera dîrokî , komela tevane, ji hemî dewletên endam daxwazkir ku , doza deqa ragiyandinê bikin û ji belavkirin , derxistin , xwendin û şirovekirina wê re , bi taybetî di dibistan , amojgeh û hemî navendên fêrkirinê yên dî de kar bikin. Bêyî ku , cudatî, di navêna tu welat û navçeyan de, çi çûk an mezin hebe be .

**Pêşgotin** :

*- Di dema ku , lixwenandin û bawerî bi rûmeta tevaya endamên malbata mirovatiyê û bi wekheviya mafên wan yên neguhêrbar , ew bingeha azadî , dadmendî û aştiyê di cîhanê de ye . Jibîrkirina mafên mirovan hîşt ku , pir karên qirêj û hovane ku , ziyan gihandî wijdana mirovahiyê bibin . Û armanca tevaya mirovan ew bû ku , avakirina cîhanekê , tê de azadiya gotinê û ayîna herkesekî parastî be , û ji tirs û birçîbûnê azad be . Û di dema ku, girîng bû ku , zagon parastina mafên mirovan bike , da ku mirov li dawiyê neçarnebe ku , li dij zulim û zorê serî hilde.Ji nû ve, miletên yekgirtî di belgeya mafên mirovan de, ayîna xwe bi mafên mirovan yên bingehîn , rûmeta kesan û wekheviya mafên jin û mêran tekûz û mêlag kirin û biryara xwe dan , ku koletiya civakî rakin û sewiya jiyana xelkê di heyameke azad û fere de , bilindbikin .Û dewletên endam jî soz dan , ku bi miletên Yekgirtî re alîkariya parastina mafên mirovan û azadiyên bingehîn bikin û rêza wê bigirin . Û dema ku , ji têghiştina van maf û azadiyan re , girîngiyek mezin bo bicihanîna vê soz û peymanê heye , wêlomê komela tevane bi vê ragiyandina Cîhanî ya mafên mirovan bang dike û dibîne ku, tiştekî hevpişke , gereke hemî gel û miletên cîhanê ji xwe re bikin armanc , ta ku , herkes û komîtak di civakê de, vê ragiyandinê bi ber çavên xwe de , û rêza wan maf û azadiyan di xwe de , di riya hînkirin , perwerdekirin û standina biryaran de , çi netewî an cîhanî biçîne. Heya ku , bendên di vê belgeyê de , li hemî deverên cîhanê parastî bimîne û binpê nebe .*

*Bend 1 :*

*Hemî mirov azad , û di rûmet û mafan de , wekhev dizên , û tev xwedî hiş û wijdan in. Û ji wan tê xwestin ku , bi giyaneke biratî bi hev re bidin û bistînin .*

*Bend 2 :*

*Ji mafê her mirovekî ye , bidesxistina van maf û azadiyên di vê ragiyandinê de hatine. Bê ku ,tu cudatî bi sedema nijad , reng , celeb , ziman , ol ,nêrîna rêzanî , an nêrîneke dî , an koka hemwelatî , civakî an jî çi rewşeke dî yan jî di navêna mêr û jinan de hebe . Bi ser tiştê hatî de , cudatiya ku , bingeha xwe , rewşa rêzanî , zagonî an navnetewî ya welatê ku , ew kes jê jî divê tune be . Çi ew welat û cîgeh serbixwe, bindest , bê otunumî an jî serdestiya wê bi awakî ji awan bendkirî be .*

*Bend 3 :* **D.R.( 10 )**

www.arsivakurd.org

# Bîranîna Apê Mûsa Enter

**Amedekar : Reşoyê Pîrê**

**Li** Kurdistana Bakur, herêma Mêrdînê, gundê Zivingê, di şikeftekê de, sala 1920 an, Mûsa Enter ji dayîk dibe . Mûsa ji êla Botan û malbata Mihoyê Teze ye. Sê zarokên wî hene . Enter, Reşan û Dicle

Mûsa xwendina xwe ya pêşîn, li Mêrdînê û ya lîsê li Enedolê kuta dike.Mûsa Enter, cara pêşîn, li Enedolê tê girtin. Ew ji bo xwendina zanîngehê, berê xwe dide Istenbolê, di şaxê edebiyetê, beşê felsefê de bi cî dibe . Di zanîgehê de, pir xwendekarên Kurdperwer Mîna Mustefa Bucak, Fayq Bucak,Yusif Azîzogju...... dinase. Û bi hev re pir komelan dadimezrînin .

**1**- Pansiyona şagirtên Dîcle, sala 1942an .

**2**-Komela Hêvî sala 1943an .

**3** – Komela rizgarkirina Kurdan 4- Pansiyona şagirtên Firat sala 1948 an.

Maûsa Enter, di sala 1958 an de, dest bi weşanên xwe dike. Gotara yekemîn ya di bin navnîşana " Eman çi welatekî pêşketî ye " di rojnama " Îlerî Yurt" ya ku, li Amedê derdiket de diweşîne. Di sala 1959 an de, gotarekê bi navnîşana " Qimil " di wê rojnamê de belav dike . Ji bo wê gotarê, Mûsa tê girtin . Piştî tê berdan, careke din tê girtin û berê wî didin Istenbolê, di oda 38 an de, şeş heyvan radikeve. Mûsa, di wê şeş heyvan de, pirtûka xwe ya yekem, ya bi navê " **BIRÎNA REŞ "** dinivîse. Di sala 1963 an de, bi Yaşar Kaya, Medet Serhat û Ergîn Koyncu re, **kovara Deng** diweşîne. Piştî du heyvan, conta Tirk, destê xwe didin ser kovarê û Mûsa Enter dixine girtîgehê .Di sala 1965 an Birîna Reş û di sala 1967 an de Ferhenga Kurî diweşîne . Di 1969 an de, ji ber nivîsa xwe ya di rojnama " Dogo" de, hatibû weşandin careke din têye girtin. Di sala 1971 an de, ji hêla dadgeha Amedê, ya contayê ve tê girtin û Çar sal ceza didine wî. Piştî ji zîndanê tê berdan, di sala 1976 an de, Mûsa Enter vedigere gundê xwe û ta sala 1989 li wir dimîne. Di wê salê de, Mûsa vedigere Istenbolê . Li Istenbolê, kovarên " **2000 , Dogru, Medya Gîneşî û Den "** Hevpeyv û nivîsarên Mûsa Enter diweşînin . Di sala 1990î de, Pirtûka wî ya bi navê "**Hatiralarim**" ji hêla pirtûkxaneya " Doz " ve tê weşandin. Di wê salê de, partiya " **Keda Gel** " tê damezrandin û Mûsa Enter cihê xwe di nêv refê wî de digre û dibe endamê komîta partî, ta qedexekirina partî ji hêla conta Tirk ve, karê xwe berdewam dike . Ji sala 1990î, dema weşandina rojnama " **Yênî Ûlke** " ve, nivîsarên Mûsa Enter, her hefte, , bilî nivîsarên wî, di rojnameyên **WELAT** , **TEWLO** û kovara **REWŞEN** de, têne weşandin .



Di 20 ê Rezbera ( Êlon ) 1992 an de, kalemêrê 74 salî, →

www.arsivakurdi.org

Apê Mûsa Enter, li Amedê, ji hêla hêzên reş û tarî ve tê kuştin.

**Dostaniya** Yaşar Kemal û Apê Mûsa Enter , ji demeke dirêj ve ye . jiyana Apê Mûsa berdewam dike . Piştî kuştina Mûas Enter , Y . Kemal nivîsarekê, di der mafê wî de dinivîse . Ev nivîsar rojnama Tirk ya bi nav û deng " **Cumhoriyet** " , di rojên 26-27ê Sibata 1992 an de diweşîne . Emê hin parçeyên bijarte , ji wê nivîsarê pêşkêş xewndevanên Newrozê bikin .

" ***Apê Musa Enter , di rojên reş û tarî de , herdem ronak , hêvîdar û bawermend bû . Civak û mirov , çiqas xerap be , wî herdem quncikekî rind û qenciyek tê de didît . Nêrîn û gotinên mirovan , li hember wî çiqas ters û sertbana jî ; Wî bi çavekî nerim lê mêze dikir . Ew bi çanda gelê xwe pir bawermend bû . Bi hemî hêza xwe ve , li dijî wendabûna çanda gelê xwe disekinî û didît ku , çanda gelê xwe , ji çanda cîhanê re alîkar e . Ev bawerî , ta dawiya jiyana wî ajot û berdewam kir .. Ji ber baweriyên xwe ve , bi mêranî berxwe dida . Lewre jî hat kuştin . Kuştdar , an yên Apê Mûsa , dane kuştin , Tirkiyê jî xwerin , Anedol vegerandin gola xwînê . Ew kesan , xerpî û kuştina Tirkiyî dixwazin . Ev karê dîktetorên xwîndar in . Tirkiyê , divê neketa devê vê riyê . Em dikevin sedsala Bîst û Yekan , Ev leka reş di eniya me de , mirovatî napejrîne***" .

Di vê nivîsarê de , Y . K . Dîsan dike qêreqêr û banga xwe dike û welathezan , daku vê kuştinê ji holê rakin " ***Tirkiya û mirovatî , kuştina kevokên aştiyê , wek Mûsa Enter napejrîne . Ji ber , evqas sitem û piştî evqas xwînrijandin , lihevkirin pir zor e. Ez di bextê we de me , rê nêzîke , wext heye , ji bo xatirê xwîna yên wek Mûsa Enter , ji bo xatirê evîna biratiya hezar salan û ji bû bedewiya biratiya paşerojê , werin em vî karî çareser bikin , tiştekî ewqas dijwar nîne***" .

Yaşar Kemal , nivîsara xwe, bi van gotinan kuta dike : ***"Bi rastî , eger mirov bi qasî Mûsa Enter , ji welatê xwe hez bike – Eger demoqrasî hebe – emê ji vê astengê derkevin . Ji ber ku , baweriya min gelekî bi Mûsa Enterên vî welatî heye . Çi Tirk û çi Kurd be .***

***Bila bijî Mûsayên Enter , Apê Mûsa "***

**Jêder :**

**1 - Kovara Reşen. Hejmar 1 . Sal 1996**

**2 - Kovara Nûdem. Hejmar 7 . sal 1993**

********************************************************

## Dumahîk:Ragihandina...

Jiyan , azadî û parastina kesayetiyê , ji mafê herkesekî ye .

*Bend 4 :*

***Çênabe tu kes bindest an bê kolekirin . Û kolekirin û bazirganiya koleyan , di hemî rewşan de qedexe ye .****Bend 5 :*

***Nabe tu mirov bê işkencekirin û cezakirin an jî danûstandinên hişk , hovane an jî yên ku , ji rûmetê kêmdikin vêre were kirin.***

www.arsivakurdi.org

# Ji bîranîna Îsmîlê dîn

Rojeke ji rojên zivistanê, baran bi hêz dibare. Îsmîlê dîn , li ber devê derî sekinî û got : (( ***Eger ev barana, di destên mirovekî hişmendeba, wê têra me salekê kiriba ))***

Di rojên 27-28 ê Çiriya Pêşîn de, li parêzgeha Hesekê ( serxet û bnixetê), baran bi hêz barî, destlata Trik, daku ziyan negihe wan, devê bendên li serxetê ( benda Xankî) vekir û lehî bi ser bajarên Serêkaniyê – Hesekê û gundên pêve girêdayî herikî. Li gor, agahiyên ragihandinê, ji encama wê lehiyê bi dehan mal wêran bûn û ziyanek mezin gihaye xelkên wa deveran. Ji bilî vê jî, bêtirî deh mirovan ,jiyana xwe wendakirin û pirtirî wan jî, wendabûn.

Li hember wê xişm û bêtarê, destlata Sûriyê matmayî dimîne , bêyî ku alîkariya wan bike .Bi navê komîta weşana NEWROZ û xwendevanên wê, em serê wan saxdikin û cihê wan bihuşt be.



Wêneyên xişim û bêtara Serê Kaniyê



## Banga hêvîtiyê

Rojnama Newroz , Munteda Nûredîn Zaza ya çanda kurdî li Sûriyê , Rojnama Deng , Kovara Pirs , û Saziya mamoste û fêrkerên zimanê kurdî li Sûriyê , bangek hêvîtiyê, ji Kak Mesûd Barzaî , Perleman û hikometa Kurdistan re rêkirin. Naveroka wê bangê ev e : Hêvî ew e ku , veger li biryara perlemanê, ya bikaranîna Alfebeya Erebî, bi şêwakî fermî çêbibe û li şûnê Alfebeya Latînî bi kar were . Ji ber ku ,Alfebeya Latînî bêtir bi kêrî fonetîka zimanê me tê û wê têr dike , yan jî bi kêmanî herdu alfebê li rex hevdu bi kar bên.

www.arsivakurdi.org

# Dawiya Zordariyê rûreşî ye

**Dîlan Zivingî**

Piştî Sedam Husên , xwinvexwarê gelê Îraqê , yê dîktetor û setemkar ,di zêrzemîn û berqefan de dihate girtin . Ew davêtin binê hebis û zîndanan . Wehan jî , li-9-ê Nsana -2003-an , weke şaneke pîrozî û azadiyê li gel xelikê Îraqê , nemaze li ba gelê kurdistanê dibû rojek bi nîşan. Ew ji bin nîrê hovîtiya Sedamê bêbexit rizgar bûn . Lê belê, tiştê bêtir dilê mirov hênik û rihet dikir. Dema ew, bi rengekî aşkere , li pêş xelikê cîhanê tev , di qanalên têlvizionî esmanî de dadixistin pêş dadigehê, da ku setemkariya Sedam û duvçilên wî bibînin û nasbikin . Belikîm , rijîmên derdora Îraqê, yên mîna dîktetor Sedam , pir sûdan , ji vê bûyerê werbigrin .

Pir heyif û mixabin ku , li beramberî evqas sal, zor û setemkarî, li serê gelê me yê kurd , li wêrê dikir û herweha li serê gelên Îraqî dimeşand. Daxwez û armanca wan (Sedam û dûvcilan) ku, gelê kurd tarûmar û tune bikin .

Lê, weke helibestvanê kurd yê nemir Yonês Dildar , di sirûda Eyreqîb de , herdibêje: Kes nebê kurd mirdiwa Kurd Zindiwa .

Ma gelo! Tu hêz , dikarin hebûna bêtirî çêl miliyon kurd, li darê dinyayê tarûmar û tune bike. Ev miletê ku , ji evqas sal ve, li ser xaka bav û kalên xwe cîwar e. Xwedî dîrok , ziman û tore ye. Lewre jî, divê tev baş zanibin ku , miletê kurd xwedî dozeke rewa û dadimend e. Dem ne dema pişaftina miletên mîna gelê kurd e.



Wisan jî, xelikê cîhanê tev, li pêş alavên ragihandinê yên bi kêrhatî, li dawiya mirovekî mîna Sedam , ku cezayê darvekirinê pê hatiye wergirtin. Hê jî doza kurdên Enifal û Helebçe , li dadegehê berdewam e . Tenê, di doza dicêl de , sezayê darvekirinê,bi wî û Berzan Tekirîtî û Ewad Elbender ve hate standin.

Wisan jî, li -5-ê çirya duwem, di rûpela dîroka Îraqê de, mîna xaleke geş cî digirtî. Xelikê ducêl, di vê rojê de, aheng li dar dixistin ! Ma gelo! Çiqas car, ew û duvçilên wî , hêjayî darvekirinê ne. Vêca jî, pir pir pêwîste, ku her rijîmek , zor û lêdanê , li serê gelên xwe, nemaze li serê miletê Kurd dikin , ciqas giringe , ku ew rojekê pêş ve , li xwe bizîvirin, sûd û îbiretên xwe , ji Sedam û berdefkên wî bigirn û hilînin. Ji ber ku , dawiya zordariyê rûreşî ye û rojên li pêş yên miletên bindest e .Ne wilo ? Ma xwendevanên Newroza me ,çawa dibînin û çi dibêjin?.

***Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de***

www.arsivakurd.org